



Wekî em dizanin, ev desthilatiya Erdogan/AKP'ê ya tekparêz bi dagirkirina şaredariyan re nema, di serî de jin bi hezaran kedkarên şaredariyan ji kar avêtin û hemû saziyên girêdayî şaredariyan rûxandin, vala kirin û li gor berjewendiyên xwe teşeyê da wan. Piştî ku qeyûmên pergalê hatin ser kar, hunera xwe ya pêşîn bi rakirina kreşên ku bi zimanê dayîkê ango bi zimanê Kurdî dixebitîn û ji kar avêtina hemû kedkarên jin ên wan kreşan nîşan dan. Bi wê awayê neyartiya xwe ya ji Kurd û zimanê Kurdî û ji jinê re bêhtir zelal kirin.

Diktator û tekparêz

ji jina azad û serbixwe ditirsin

• Nesrîn NAVDAR

Hilbijartin berhemeke serdema hemdem e ku derfeta pêşxistina azadiya fikr û hêza îradeya gelan bi awayekî demokratîk û piralî dabîn dike. Li piraniya welatên ku bi rêbaza hilbijartinê tîr birêvebirin mafê her kesî/ê heye ku hilbijêre û were hilbijartin. Dîsa mafê tu kesî/ê tune ku mafê hilbijêrê û hilbijartinê kesa asteng bike an jî ya xwe bi zorê li kesa ferz bike. Bi gotinek din em dikarin bibêjin ku rêbaza hilbijartinê di esase xwe de li dijî tekparêzî, despotî û diktatoriyê ye. Lê mixabin diktator, tekparêz û faşîst-pirî caran ve awayê jî li gor xwe fesilandinê û dîsa bi ya xwe kirine.

Dijminahiya li hemberî jinê

Wekî me di dîroka nêz de, di van çar salên dawî de li Tirkiyeyê jî dît, ku bi çar awayî mafê hilbijartinê ya gelan hat bînpêkirin. Piştî hilbijartinên giştî yê dawî bi dehan parlamenterên Kurd ku bi îradeya gelan hatibûn hilbijartin, ji hêla erkdarên tekparêz ve hatin girtin, parlamenteriya wan hat daxistin û hîna jî di girtîgehên de dîl tînin girtin.

Her wiha ew mudaxileya derhiqûqî û antidemokratîk ne tenê li hember parlamenteran li hember rêveberên xwecihî yê Kurdan jî pêk hat. Gelên Tirkiyeyê û hemû gelên cihanê bûn şahidê destserkirin û dagirkirina nêzî sed şaredariyên DBP'ê ku bi şîra "em ê xwe û bajarê xwe birêve bibin" bê deyndarî gelek kar û xebatên baş û serkeftî derdixistin bûn holê.

Wekî em dizanin, ev desthilatiya Erdogan/AKP'ê ya tekparêz di dagirkirina şaredariyan û bînpêkirina îradeya gelan de nema, di serî de jin bi hezaran kedkarên şaredariyan ji kar avêtin û hemû saziyên girêdayî şaredariyan rûxandin, vala kirin û li gor berjewendiyên xwe teşeyê da wan. Piştî ku qeyûmên pergalê bi xesparkariya xwe cihên rêveberên hilbijartî dagirtin, hunera xwe ya pêşîn bi rakirina kreşên ku bi zimanê dayîkê ango bi zimanê Kurdî dixebitîn û ji kar avêtina hemû kedkarên jin ên wan kreşan nîşan dan. Bi wê awayî neyartiya xwe ya ji Kurd û zimanê Kurdî û ji jinê re bêhtir zelal kirin.

Têkoşinek her alî a li hemberî feraseta tekparêz

Dema mirov li dîrokê dinêre dibîne ku diktator û tekparêzan ji destpêka xwe ve heta roja îro her tim neyartiyê bi jinê re kirine. Beriya her tiştî ew jî hêza jinê ya mirovhez, aştxwaz û bi awayekî pîrhêlî, nêrîna wê ya li jiyandê ditirsin. Dîtirsin ku jin hêza wan a ku bi neheqîyan xistine destê xwe ji wan bigrin. Loma an hewl didin jinê bikin xizmetkar û mehkûma malê, an jî wê ji cewhera wê bidin bidûrxistin, bişibînin xwe û bikin îtiatkareke xwe ya sadiq. Ger em li jinên ku li derdora wan in binêrin em ê bi hêsanî pêrgî wan xisletên çêkirî bîn ku çawa ji gotina mêrên derdora xwe der nakevin, wan ji ser xwe de dibînin, bi wan re dikenin û bi wan re digrî. Bi gotineke din diktator û tekparêz ji jina azad, serbixwe û zana ditirsin û dixwazin jina kole, pêgirtî û nezan li derdora wan be ku ji her kirinên wan ên faşîst re bibêje erê.

Li hember wê feraseta tekparêz û baviksalarî, siyaseta demokratîk a ku bi mirateyêke bîst - sih salan e têdikoşe û îro jî bi pêşengiya jinê, bi şîra

pirçandî, pîrzimanî û pîrrengî hewl dide azadî, aşî, aramî û wekheviya civakê, politîka û siyaseteke rast ava bike û hemû xebatên xwe di wê çarçoveyê de dimeşîne. Ji ber wê çendê jî her tim dibe hedefa siyaseta desthilatparêz û tekparêz û ducarê rêbazên wan ên antidemokratîk û derhiqûqî dibe. Wekî beriya her hilbijartinan hat dîtin ku beriya hilbijartinê xwecihî ya pêşiya me jî pergala tekparêz siyaseta demokratîk ji xwe re hedef girtiye û ji bo xebatên hilbijartinê di eniya demokratîk de lawaz bihêle pêlên binçavkirin û girtinan daye destpêkirin.

Polîtîkayên qirkirin û tune kirinê

Ji niha ve xûya ye ku wê di hilbijartinê xwecihî ya di 31'ê Adarê de jî gelek leyistik, hîle, dek û dolab bikevin dewrê. Li hember wê lazim e gelê Kurd û hemû gelên demokratîk û aştxwaz bi hev re bixebitîn û wê desthilatiya ku li hundir û derve gelan bi hev dide qirkirin û li gor berjewendiyên xwe şerê di navbera wan de gur dike, di sindoqan de bifetisînin. Ev desthilatiya ku dixwaze bi çêkirina kîna û nefreta di navbera gelan de xwe li ser piyan bihêle, di van mehên dawî de wekî di hilbijartinê dawî de kiribû rêbaza operasyona li ser Rojava xistiye rojava xwe û bi wê hewl dide agirê nîjadperestiyê gurr bike û di hilbijartinê de sûdê jê bigre. Ev politîka û siyaseta ku li ser qirkirina Kurdan tê meşandin û bi nêzbûna hilbijartinan re gur dibe, ji bilî danîna zîrar û xisarê tu têkariyê nade gelên li Tirkiyeyê. Îro rewşa ku Tirkiyeyê têde ye û rêya ku desthilatiya tekparêz berê wê dayiyê ji bobelatekê pê ve ne tiştê e. Bi israrkirin di wê yekê de, gel ber bi xetereyê mezin ve birin e. Dîsa di şer de israrkirin, di qeyrana aboriyê de fetisandina gelan e. Şer û alozî tenê kêrî desthilatan tê, loma her tim alozî, şer û gengeşiyên diafirînin.

Îro tecrîda li ser Rêberê gelê Kurd, êrişên ku li gelan, li ser kedkar û karmendan, li ser ronakbîr û akademîsyenan, li ser sazî û siyaseta demokratîk pêk tînin jî bi wê mexsedê tînin kirin. Ev hewldanên wan bi hemû hêlan ve ji bo berjewendiyên wan in û ji bilî zîrarê tu tiştê naghîne civakê. Sedema wê tengasiya aboriyê ku îro gelê têde ye jî encama şerê

çar salên dawî ye. Ger em bi bîr binin di pêvajoya çareseriyê de hem jî hêla aborî de, hem jî ji hêla derûnî de civakê ji îro de qat baştir bû. Helbet îro baş tê fêmkirin ku ew rewşa bi aramî ne merîfeta Erdogan/AKP'ê bûye, merîfeta pêvajoya çareseriyê bû ku mixabin ji hêla Erdogan ve hat qolibandin û roj bi roj zêdetir ber bi xetereyan ve hatin kişandin. Ji ber wê yekê, divê civak bizanibe ku ne di roja me ya îro de ne jî di siberoja me de, başiya di hêla aborî, aramî û derûnî de ji hêla wê desthilatiya heyî ve nayê avakirin. Berovajî wê her ku biçê alozî, qeyran û bi hemû awayê ve xetereyên jiyandî dike para gel û civakê. Di wê xalê de awayê ku hewce ye civakê tev bigere, xwedîderketina li vîna xwe, xwedîderketina li wekheviya civakê û aştiya di navbera gelan e.

Li Kurdistanê talan û rûxandin

Di van rojên ku hilbijartinê xwecihî nêz dibe de peywirên girîng dikevin ser gelê Kurd jî. Me dît ku pergala desthilat bi tayînkirina qeyûman henekê xwe bi vîna gelê Kurd kir. Herwiha bi tayînkirina wan re hemû kedkar û xebatkar ji kar hatin avêtin û destkeftiyên ku keda dehan salan bûn hatin rûxandin û talankirin. Ji bo paşvegirtina destkeftiyên xwe lazim e gelê Kurd bi siyaseta xwe ve xebateke bi rêk û pêk bide pêşiya xwe. Ji derveyî bîrdoziyên ku di kêleka desthilatiya zilimkar de cih digrin, divê beriya her tiştî yekîtiya xwe ava bikin. Bila li ka kî di çî fikr û çî baweriyê de ye neyê nihêrtin, tev di bin banekî de, di wê rêya ku wê hêzê bide netewbûna wan de bimeşin. Û divê wê meşa xwe bi ketina nav gel de taçdar bikin. Fikra gel bigrin, daxwaz û hêviyên wan guhdar bikin, ji tengasiyên wan re bi qasê hêza xwe çareseriyê bibînin. Divê girêdana xwe û gelê xwe qehim bikin. Em dizanin ev gel tucar mirovan bêbersiv nahêle. Siyasetmedar çiqas xwe nêzê gel bikin ewqas jî wê gel bersiva wan bide. Di wê siyaseta medar û rêveber bi wê hişmendiyê nêz bibin û ji bo kêmasiyên dema borî zû bîn bihurandin, hîn zêdetir bi baldarî nêz bibin. Ji ber wê yekê dema ku me şaredariyên xwe paş ve girtin, em ji wan şaşî û kêmasiyên xwe dersan derînin,

xwe perçeyek ji civakê bibînin û bêhtir hesas û baldar tev bigerin. Wê demê de destkeftiyên me bihtir di ewlehiyê de bin.

A bi ser bikeve vîna gelan e

Wekî tê zanîn, yek ji rêbaza pergalên antidemokratîk an jî desthilatiyên tekparêz û diktatoran jî bikaranîna hilbijartinan e. Rejîmên wiha ji kirinên xwe yê antidemokratîk, faşîst û dermîrovî re hilbijartinan wek rûpoş û rûberêkî bi kar tînin. Encama hilbijartinan çî dibe bila bibe tevî bikaranîna hêza xwe ya erkdarîyê bi ceribandina hemû rêyên derhiqûqî, bi awayekî encamê li gor xwe vediguherînin. Çawa ku beriya niha gelek minakên bi wê awayê ketine rûpela sosret a dîrokê, ev çend salên dawî de li qada siyaseta Tirkiyeyê jî gel dibin şahid û mexdûrên wê rêbazê. Di van çar salên dawî de gelê Kurd û hemû gelên ku li Tirkiyeyê dijî di hilbijartinan de dibin şahidê dek û dolab û mudaxileyên derhiqûqî yê Erdogan ku niha jî hem serok e, hem serokkomar e, hem jî serdozger e.

Helbet em dizanin piraniya van erkên xwe yê bi zordarî jî li dijî gelê Kurd dixebitîne. Her wekî ku em dibînin, bi nêz bûna dîroka hilbijartinên xwecihî, dîsan gefan li vîna gelê Kurd dixwe û vî yekê jî wek karê xwe yê sereke dibîne. Ji ber ku baş dizane wê gel di hilbijartinan de bersiva wî û qeyûman bide. Bi gotina xwe ya wek 'em ê tayîna qeyûman bidomînin' dixwaze gefê li gel bixwe, wan di terciha wan de dudilî bihêle û bê çarebûyîniyê di giyana wan de bide çêkirin. Li gor wî, bi van gefan wê gelek kes bikaranîna dengê xwe wek hewldanek vala bibîne û pêwîstî ne-bîne ku biçê ser sindoqan. Her wiha ew wisa difikire ku ji bo demekê be jî de gefên wiha bê hêviyê li ser mirovan çêbike, an jî kesên ku ji ber gefan biryara şewitandin, an jî nexebitandina dengê xwe bidin hebin. Lê gelê Kurd wek her carekê xwedî li vîna xwe derdikeve, ne bi gefan paş de gav diavêje, ne jî ji bertîlan re destê xwe dirêj dike. Gelê Kurd her wekî hilbijartinên beriya niha wê di hilbijartinên li pêşiya me de jî dîsa îradeya xwe nîşan bide.

Dema mirov li dîrokê dinêre dibîne ku diktator û tekparêzan ji destpêka xwe ve heta roja îro her tim neyartî bi jinê re kirine. Beriya her tiştî ew jî hêza jinê ya mirovhez, aştxwaz û bi awayekî pîrhêlî, nêrîna wê ya li jiyandê ditirsin. Dîtirsin ku jin hêza wan a ku bi neheqîyan xistine destê xwe ji wan bigrin. Loma an hewl didin jinê bikin xizmetkar û mehkûma malê, an jî wê ji cewhera wê bidin bidûrxistin, bişibînin xwe û bikin îtiatkareke xwe ya sadiq.

